



## Efrîn di bin dagîrkeriyê de (97):

**Belavkirina ramana olî ya tundrew, teqandin û şewtandinên berdewam, bînpêkirinên li dû hev**



Siyaseta Dewleta Turkiyê ya Toranî perensîpa "Hebûna Turkiyê bi tunekirina hebûna Kurdan ve girêdayî" dimesîne, û li gor wê perensîpê, bi şev û roj û bi hemî alav û şeweyan şerê Kurdan - li kû dibin bila bin - dike. Û kiryarên li Efrîna Kurdî dibin, nimûneyeke herî balkêş e li ser wê siyasetê. Ji dema ku, Efrîn dagîrkirî ve û ta niha, hewildide ku, hebûna Kurdan tê de tune bike, û çanda kîn û zikreşiyê li ba milîs û anîndeyan li dijî Kurdan, û bi behaneyê (gawir, milhud û cudxwaziyê) gerek şerê wan were kirin diçîne. Ev bi xwe jî, valahiyeke kûr di navbera xelkê yekwelat de (Kurd, Ereb û yên din) çêdike, û çetin dibe ku, bi hêsanî were derbaskirin. Û herweha jî, di bin serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê û saziya "Diyant a Turkî" de, çanda olî ya tundrew di nav xelkê herêmê de, bi riya avakirina dibistanên olî, û dandina diyarî û cîwazbûnan bo zarokan, belav dike. Weke çawa li vê dema dawiyê, dest bi guhertina îmamên mizgeftan ên berê û ji xelkê herêmê, bi îmamên nû yên ji anîndeyan û li ser lîsteyên "Îmam Elxtîb" hene, kirî, û tiştê li bajarê Cindirêsê û hin gundên wê bûye, nimûneyeke balkêş e.

Hikometa Turkiyê û bi hevkarîya "hikometa Sûrî ya demkî" ya bi Hemahengiya Sûrî - Ixwanî ve girêdayî, di riya sixûr û saziyên xwe re kar dikin ku, guhertineke demografî li herêma Efrînê çêbikin. Û li vê dawiyê serjimareke xaknîgarî ji malên navça Bilbilê bi tevayî re, li gor neqşeriyên "Gogilê" çêkir, û mal nimrekirin û nasnameyên ên tê de (ka ew malbat Kurd in, an Ereb û Turkmanên anîndeyî ne) bêlî kirin.

Û ev jî hin bûyerên çêbûne ne:

-Li 29.6.2020an agirek mezin bi çiyayê Hawarê - başûrê gundê "Çê" - navça Reco ket, û rûberin fere ji ihraşê -yên ku, piraniya wan bi darên çolê yên kêmdîtî nixumandî ne - hatin şewtandin.

-Li 1.7.2020an, ciwan "Mistefa Mihemed Yûsif kurê Menên" ji xelkê gundê "Hec Qasma" - Mabeta û yê ku, li gundê "Husê" - Mabeta rûniştî bû, bi dara gûzê ya nêzik malê ve, darvekirî hate dîtin. Û berê çekdaran xwediyê wî ji mala wan ya li "Hec Qasma" qewitandibûn.

-Di siya fewdalîzim û serberdayetiya asayî de, li 3.7.2020an, teqînek li bajarê Efrînê - taxa Eşrefiyê - li nêzik dibistana "Meyselûn" rûda, û di encamê de, du kesan jiyana xwe ji dest dan, û hin jî birîndar ketin. Hêjaye bi bîr were ku, milîseya "Lîwa'i Elmu'itesêm" ya ku, "Mistefa Sêcerî" serkêşiya wê dike, wî ciyî desteser dike.

-Di pêvajoya destdanîna ser arziyên giştîyane û taybet de; Milîseyên çekdar ên ku, bajaroka Meydankê ya geştîyarî û gundên derdorê destlat dikin, dest danîn ser kenarên golê, û /5000/P.S ji her seredanêrekî bixwazibe li rexê rûne distînin, û keştiyeke biçûk jî bi /15000/P.S kirê didin kesê bixwazibe gerekê di golê de bike.

-Hemwelatî "Rêzan Remzî Bîlal /37/sal" ji xelkê gundê "Dîkê" - navça Reco, ji aliyê rêbendeke lêgerînê ye li derbasgeha kevana rojhilatê bajarê Efrînê, "bi tuhmeta endamtiya wî ji PYD" re - piştî nasnama wî li fîş xistin - hate girtin. Ji xwe li ber her derbasgeheke serekîn a bajarê Efrînê, rêbendeke leşkerî heye, nasnamên yên derdikevin û dikevinê -bi taybetî jî yên Kurd- li fîş dixînin.

Berdewamkirina dagîrkeriya Dewleta Turkiyê û bi pêrozkirina "hikometa Sûrî ya demkî" ji hin herêmên Sûriyê yên sînordar jê re; Dibe kelemek serekîn li pêş dîtina çareseriyêke siyasî ji kirîza Sûriyê ya domdar re, û ji erk û stubariya civaka navdewletî û hikometa Sûriyê ye ku, jê daxwaza vekîşînê ji van herêman bikin, da ku, vegehin serweriya niştîmanî ya Sûriyê û rêvebiriya xelkê wan.

5.07.2020an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**  
**Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

-----  
**Wêne:**

- Xort Mustefa Mihemed Yûsêf.
- Teqandina taxa Eşrefiyê - Efrîn.
- Çiyayê Hawarê - Reco.